

Deqa Pîroznameya Encûmena Niştîmaniya Kurd Li Sûriyê ji Kongira pêncemîna awarte ya Partiya Yekîtiya Demokrat(P.Y.D) re, ji bal birêz Mustefa Meşayix ve hate xwendin:

Pîrozname

Xwişk û birayên hêja,
Birêvebir û endamên kongira pêncemîn a
awarte ya Partiya Yekîtiya Demokrat
(P.Y.D),
Beşdarên birêz...

Bi navê Komîta
Peywendiyên hevbeş
a Encûmena Niştîmanî
ya Kurd li Sûriyê, em kongira we pîroz
dikin, hêvîdar in ku hûn di kar û bar û
biryarên xwe de dûrbîn û serkeftî bin.
Bêgomane ku kongira we di dem û rewşeke
taybet û hestiyar ji dîroka welatê me Sûriyê
de tê li darxistin. Ji alîkî ve, şoreşa Sûriyê ji
salek û sê mehan ve li dar e û ber xwe dide,
bi armanca pêkanîna azadiyê û parastina
rûmeta gel têdikoşe. Ji aliyê din ve, rejîma
Sûriyê a totalîter û tek-partî, bi hovîti wê
tepeser dikie û xwîna gel dirijîne, gund û
bajaran topbaran û wêran dike, ji tund û
tûjiyê pê ve, tu awayên çareseriyê nas
nake!!..

Me Kurdan, ji hemû pêkhatayên Sûriyê
bêtir zor, sitem û çavsoyîya rejîmê dîtiye, bi
agirê kîn û zikreşîya şovenîzmê hatine
şewitandin!! ...Ji ber wilo jî, ji roja pêşîn a
şoreşê ve em di nava rêzên wê de ne û me
gelek pakrewan û qurbanî li ser rêya
azadiya gel û welatê xwe danîne. Her me
hewl daye, hê jî ji bo çareserkirina doza
Kurd a dadmend û misogerkirina mafên
gelê xwe di makezagona bingehîn de em
kar û xebatê dikin.

Xwişkino...Birano
Di bawerîya me de, îde dem hatiye ku em
Kurd bi hemû rêxistin, partî û hêzên xwe ji
dil û can hewl bidin ku deng û rêzên xwe bi
yek bikin û ji bo berjewendiyên gelê xwe
yekîtiya mezin ava bikin, destan bidin hev,
baweriyê bi hev bînin û bi yek dengî

daxwaza mafên gelê xwe bikin û vê derfeta
zêrîn ji destên xwe bernedin.

Bila em weke her car bi dek, dolab û
sozên neyarên gelê xwe neyên xapandin û
nekevin feq û davên wan, bila em nebin
ardiwê tenûra wan!..Bila em hînî çanda ji
hev hezkirinê bibin, rêz û rûmeta hev
biparêzin û em bawer bin ku em bi hev
mezin dibin û birîna dilê me yek e!!..

Li dawiyê, omîda me ewe ku ew belgeya
têgiştinê di navbera Encûmena Niştîmanî
Kurd li Sûriyê û Encûmena Gel a Rojavayê
Kurdistanê de hatiye imzekirin, bê parastin
û rêzgirtin da ku em hemû bi hev re karibin
aşti û hêminîya deverên Kurdî biparêzin û rê
nedin xêrnexwazên gelê me ku weke her car
me bi hev bidin şikandin!!.. Û ji bo
pêkanîna azadî, aşti û wekheviyê em bi hev
re xebateke hevbeş bikin.

Careke din, em serkeftinê ji kongira we re
dixwazin birano.

-Serkeftin ji şoreşa Sûriyê ya aştiyane re!

-Bijî xebata hevbeş ji bo bicihanîna mafê
çarenûsî ji bo gelê me yê Kurd li gora
zagon, belge û peymanên navnetewî!

15.06.2012 Z

**Komîta Peywendiyên hevbeş a
Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê**

Seyah Xelîlê Ismayil

Çû ber dilovaniya Xwedê

Di roja 4ê Gulanê 2012 an de, kesayetiya
civakî û niştîmanî, **Seyah Xelîl Ismayil** li
gundê Sîha biçûk, herêma Qamişlo çû ber
dilovaniya xwedê.

Rehmetî di sala 1934 an
de ji dayik bûye, û di
destpêka temenê xwe
de derbasî partiya



Komonîst a Sûriyê bûye, lê di van salên dawî de
bû ji piştgirên doza gelê xwe yê kurd,
Rehmetî li goristana Sîha mezin û bi beşdariya
komîta şaxê ya Encûmena niştîmanî ya Kurd li
devera Sinceqê hate veşartin....

Xwedê wî bi dilovaniya xwe şabike û aramê
bide malbat, kes, dost û merivên wî û bila serê
wan sax be.